

DESTÛRNAMEYA BEŞA TIRKÎYEYÊ YA RÊXISTINA LÊBUHURÎNÊ YA NAVNETEWÊYÎ

NAVÊ KOMELEYÊ Û NAVENDA WÊ

Xala 1ê- Navê komeleyê Beşa Tirkîyeyê ya Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî ye. Navenda komeleyê li Stenbolê ye. Navê wê ye kurtkirî UAÖ (RLN) ye. Logoya wê mûmeka reş a pêt pê ve ye û paşrengê logoyê zer e.

MEBESTÊN KOMELEYÊ

Xala 2yê- Mebestên Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, piştgirîdayîna wê yekê ye kodivê hemî mirov bigihin standardên mafên mirovan yên ko di Danzana Mafên Mirovan a Navneteweyî de hatine pejirandin.

MIJARÊN LÊXEBITÎNÊ YÊN KOMELEYÊ, PÎROZÎYÊN WÊ Û AWAYÊ XEBITÎNA WÊ

Xala 3yê -

A – MIJARÊN LÊXEBITÎNÊ YÊN KOMELEYÊ

Beşa Tirkîyeyê ya Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, bi mebesta berfirehkirina mafên hemî mirovan, mafê heyîna fizîkî û hizir û ramanî, sekinandin û astengkirina neheqîyên li ser xweifadekirinê û azadîya wijdanî lêkolîn û çalakîyan dike. Ew xebatên xwe li gor rê û rêbazên Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî dike.

B - PÎROZÎYÊN BINGEHÎN ÊN KOMELEYÊ

Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, komeleyek e ko hewil dide dan-û-standina di navbera mafparêzên li dinyayê de çê bike, ji bo wan kesên neheqî li wan hatiye kirin çalakîyan dike, wê yekê diparêze ko mafên mirovan li hemî dinyayê wek hev in û nayên guhertin, ew demokrasî û rêzgirtina ji hemî aliyên ve diparêze.

C- AWAYÊ XEBITÎNA KOMELEYÊ

Komele ji bo parastina mafên mirovan li hemberê hikûmetan, rêxistinên di navbera hikûmetan de, tevgerên siyasî yên çekdar, şîrketan û hemî hemî tiştên ji derveyî dewletan jî çêdibin, hemî rê û rêbazên qanûnî bi kar diîne. Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, ji bo ko neheqîyên li mirovan têne kirin eşkere bike bi awayekê lezgîn û îsrarkar dixebite.

Komele, li rûdanên bi tekekesan ve têkildar bi çavê mafên mirovan ê gerdûnî, bi rêbazan û bêalî dinîhêre. Komele encamên van xebatên xwe bi hemî rêyên belavkirinê belav dike û ji bo astengkirina neheqîyan dana pişt xwe ya kirina piştgirîya civatê dibizive.

Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, Ji bilî ko ew xebatên li ber çav ên ji bo parastina mafên mirovan dike, ji bo ko hikûmet maf û hiqûqê serdestgirtina bikin, piştgirîya mafên standard ên hemî mirovan bikin û wan mafan bigihînin mirovan, bi hemî alavên ragihandinê bangî hikûmetan dike.

Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, bi awayekê berfireh xebata perwerdekirina bi mafên mirovan dike. Ew hemî xebatên ji bo parastina mafên mirovan, wêrekkirin û piştgirîdana kesên û civatan, piştgirîdana karkirina rêxistinên navneteweyî, parastina wan û rêzgirtina ji bo mafên mirovan dixebite.

Komele, bi şertê ko ew ê girêdaya benda "A"yê be ko ew bend, mijarên xebitînê û mebestan eşkere dike.

a- Ew ji bo ko kiriyarên xwe baştir û saxlemtir bike lêkolînan dike,

b- Ew çalakîyên perwerdekirinê û kultûrê yên wek qurs, semîner, konferans û panelan çê dike.

c- Ji ko ew di pêkanîna mebestên xwe de biserketî be, ew ji bo rêya bihevrexebitînê koman çê dike.

d- Ji bo ku ew mebestên xwe pêk biîne, pêzanîn, belge, dokûman û weşanan bi dest dixê, ew navenda arşîvkirinê çêdike, ji bo ko kiriyarên xwe bide bihîstin, kovar, kitêb û rojnameyan derdixê û ji bo endamên xwe bultenên kiriyaran belav dike.

e- Ji bo ku ew mebestên xwe pêk biîne, cihekî bikêrhatî yê xebitînê çê dike, ew hemî tiştên teknîkî, hemî alav û amûrên hewcedarî bi wan hene, peyda dike.

f- Ew li gor qanûnan çalakîyên peydakirina piştgirîyê dike û berarîya-desteka pereyîya neteweyî û navneteweyî qebûl dike.

g- Ji bo ko ew mebestên xwe yê di destûrnameyê de pêk biîne û ji bo pereyên ko ew hewceyê peydekirinê ye karê bazirganîyê dike, cihên sanayîyê (pîşesazîyê) çê dike û bi rê ve dibe.

h- Ew civînên li ser xwarinê, konser, balo, şano, pêşangeh, karê werzîşê, kermesan, fuaran çalakîyên kêfê û hwd. çê dike.

i- Ew tiştên ko ji bo komeleyê pêwîst in dikire, difiroşe, kirê dike, bi kirê digire û ew dikare van pêkanînan ji bo tiştên xwe yê mayînde jî bike.

j- Ew heger ko pêwîst bibîne, dikare cihên ko weqf û komeleyên destûr jê re heyî pêk biîne.

k- Ew dikeve di çalakîyên navneteweyî de, ew dibe endama komele û sazgehên ji derveyê welatî, ew bi projeyan dikare bibe şîrîka van sazgehan û dan-û-standinan bi wan re bike.

l- Ji bo pêkanîna mebestên xwe, heger ko ew pêwîst bibîne, digel mafê wê yê li hejmara 5072yê yê qanûna Biryarên Di Heqê Têkiliyên Komeleyan yê Digel Sazgehên Civatî û Dewletî De, parastî bimîne, ew dikare bi şertê ko pereyan nestîne projeyên ji bilî perwerdeya mafên mirovan digel wan sazgehan bi rê ve bibe.

m- Ew li mijarên ko têkiliya wan bi komeleyê ve nîne û pêkanîna wan qanûnî ne, dikare platforman ava bike û li wan platforman bi komeleyên din, weqf, sendîka û hçd. re ji bo mebestên şîrîk bixebite.

n- Komele, ji ko bigihe mebestên xwe, hemî rengên xebitînê dike.

o- Komele, ji bo projeyên ko bi rê ve dibe an jî ew projeyên ko ew ê bi rê ve bibe, heger ko pêwîst bibîne, dikare nivîsîngehên projeyan li derveyê Stenbolê jî dayne.

ŞERTÊN ENDAMBÛNÊ

Mafên Endambûnê û Kiriyarên Endambûnê/endamkirinê

Xala 4ê — Her kesên ko lîsansa wan a karkirinê heye, heger ko bipejirînin ko ew ê li gor mebest û rêbazên di destûrê de hatiye nîşankirin bixebitin, mafê wan heye ko bibin endama/endamê komeleyê. Lê belê da ko ew kesên biyanî bibin endamê komeleyê divê wan destûra bicihbûna li Tirkiyeyê hebe. Ji bo endamên rûmetdanê li van şertan nayê nîhêrîn.

Piştî ko ji serekîtiya komeleyê re daxwaznameya xwastina endambûnê bi awayê nivîskî hat dayin, Encûmena Birêvebirîya Komeleyê herî dereng di sih rojan de ji bo endambûn an jî endamnebûna serîlêderan biryarekê dide û bi nivîsa encama serîlêdanê bersivê digihîne serîlêderan. Ew endamên ko daxwaza endambûna wan bê pejirandin navê van li deftera endaman tê nivîsîn.

Endamên bingehtî yê komeleyê, avakerên komeleyê û ew kesên ko ji aliyê Encûmena Birêvebirîyê ve, ji bo Encumenê hatîin pejirandin in.

Ew kesên ko ji aliyê maddî û me'newî ve alîkarîyên baş dane komeleyê jî bi rêya ji Encûmena Birêvebirîyê pêşniyarkirina du endaman û pejirandina hemî endaman, dikare bibe endamê rûmetdanê yê komeleyê.

Zordarî ji bo endambûn an jî dest ji endambûnê berdanê li ti kesa nikare bê kirin. Mafê hemî endaman heye ko bi daxwaznameyekê dest ji komeleyê berdin.

Jiendambûnêderketin û Jiendambûnêderêxistin

Xala 5ê — Her endam, bi şertê ko bi awayekî nivîskî daxwaza xwe dîyar bike, dikare dest ji endambûna komeleyê berde. Piştî ko daxwaza destjêberdanê ya endaman bigihe destê Encûmena Birêvebirîyê, ew kesên daxwaza destjêberdanê kirîin, dest jê berdayî têne hesabandin û kirinên ji derêxistinê tê destpêkirin. Dest ji endambûnê berdan nabe binasê wê yekê ko deynên komeleyê yê li endaman neyê hesabandin.

Ew rewşên ko divê endam ji endambûnê bêne derêxistin ev in:

a- Kirina/kirinên ne li gor destûrnameya komeleyê,

b- Bêyî ko komele destûrê bide, êxistina komeleyê li bin barên giran,

c- Guhnedana biryarên beşên komeleyê,

d- Ew rewşa ko wesfên endambûnê rabin,

e- Di jiyana xwe ya kesane de kirina zordariyê an jî parastina zordariyê,
Heke îddî'ayek hebe ko endamek di yek ji van rewşên li jorê de ye, Encumena Birêvebirîyê daxwaza jêderêxistina endaman/î/ê dide Encumena Disiplînê. Heger ko Encûmena Disiplînê bibîne ko endam di yek ji van rewşên li jorê de ye/ne, daxwaza jêderêxistinê ya Encumena Birêvebirîyê digihîne biryarê û jê derdiêxe.

f- Digel hişyarkirinên nivîskî jî, heger endamên nû di sê mehan de û endamên ko du salan mehaneya komeleyê dane jî di du salan de mehaneyên xwe nedin, Encumena Birêvebirîyê biryara jêderêxistina endaman dide.

Endamê ber behs dikare di 30 rojan de nerazîbûna xwe ji encumenê re dîyar bike.

Ew kesên ko ji komeleyê derketine an jî hatine derêxistin ji deftera komeleyê têne birin û ti heqê wan li mal û milkên komeleyê namîne.

DEFTERÊN KO DIVÊ BI MECBÛRÎ LÊ BÊN NIVÎSÎN

Xala 6ê- Komele li gor bîlanço û sazgehên defterên xwe digire
Aborîya komeleyê

Xala 7ê-

A- Belgenameyên aborîya komeleyê

Pereyên ji komeleyê re tên bi "Belgenameya teslîmstandina pere" têne standin. Heger ko pereyên ji komeleyê re tên, bi rêya bankeyan bîn, belgenameyên ji bankeyan tên yê wek dekont û hesabname li şûna 'Belgenameya teslîmstandina pere' ne. Pereyên ji komeleyê bêne dayin jî bi hesabname, fatore, fişa firotîyên parçeyî an jî meqbûza bazirganîyê têne dayin. Lê belê heger ko xerckirinên/mizaxtinên komeleyê yê wek li Qanûna 94ê ya Qanûna Bacan/bideyan hatine nivîsîn hebe, nîşannameya "li gor rê û rêbazên qanûna bideyan (bacan)" tê dayin an jî meqbûza xerckirinê/mizaxtinê tê dayin.

B- Belgenameya destûrdanê

Ew kesên ko li ser navê komeleyê pereyan kom dikin, Encumena Birêvebirîyê bi şertê ko demê destûrê bê eşkerekirin nîşan dide.

Ew kesên ko li ser navê komeleyê pereyan kom dikin, piştî ko destûra xwe teslîmî organên komeleyê dikin, dikarin pereyan kom bikin.

PRENSÎBÊN PERESTANDINA KOMELEYÊ Û ÇAVKANÎYÊN ABORÎYA WÊ

Xala 8ê-

A) Çavkanîyên perestandinê yê komeleyê li jêrê hatine nivîsîn.

1- Mehaneya Endaman: ji endaman 36 TL tê standin. Destûra Encumena Birêvebirîyê ya Giştî heye ko vî pereyî kê m an jî zêde bike,

2- Alîkarîya kereyên kes an jî sazgeh wek baxişdanê didin,

3- Pereyên ji civînên li ser xwarinê û çayê, ger, şahî, konser, pêşbirkên werzîşî û konferansan têne standin,

4- Pereyên ji mal û malkên komeleyê tê peydakirin,

5- Berarîdan û piştgirîdan, bi rê û rêbazên raveka standina piştgirîyan tên standin,

6- Pereyên ji wan kiriyarên bazirganî yê ko komele ji bo pêk anîna mexsedên xwe dike tên karkirin,

7- Pereyên bi rêyên din têne standin.

B) Prensîbên ji bo çavkanîyên perestandinê:

1- Ew pere nayên qebûl kirin ko dikare baweriya bi Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî kêm bike, an jî dikare gumaneke bêxe li ser alînegirîya wê pêbaweriya wê.

2- Yek ji çavkanîyên pereyê dakirîne yê Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî, pereyên yê endaman tên in.

3- Divê, Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî ji bo çavkanîyên pereyan li yek çavkanîyê nebe mecbûr.

4- Bi giştî, Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî piştgirîyên ji welatan û saziyên navweletî nastîne ko bêalîtiya wê xera nebe.

Ew prensîb û biryarên ji biryar û prensîbên navneteweyî ne û Rêxistin pê ve girêdayî ye, îstisnayên vê xalê ne.

PARÇEYÊN KOMELEYÊ

Xala 9ê- Parçeyên komeleyê li jêrê hatine nivîsîn.

A- PARÇEYÊN [HEYINA WAN] BIVÊ-NEVÊ NE

1- Encumena Giştî

2- Encumena Birêvebir

3- Encumena kontrolker

B- PARÇEYÊN ALÛKAR

1- Encumena Disiplînê

2- Kontrolkera komeleyê ya navcivatî

Erk û destûrên Encumena Giştî:

Xala 10ê- Erk û destûrên Encumena giştî wek li jêr hatine nivîsîn e:

a. Hilbijartina parçeyên komeleyê,

b. Guhertina destûrnameyê,

c. Dan û standinên, Li ser raporên Encumenên kontrolker û yê birêvebir.

d. Dan û standinên li ser aboriya ko Encumena birêvebir amade kiriye û biryardanên li ser wê

e. Destûrdana Encumena birêvebir ya di heqê kirin û firotina tiştên bingehîn û tiştên berdest ên komeleyê,

f. Dan û standinên û biryardanên li ser reşbelekên destûrên Encumena birêvebir amade dike,

g. Tespîtkirina hemî rengên mesref kirinên wek pereyên mehane, tezmînat û cidakirina heqrê û mesrefên rojane yê ji bo wan endamên ji bo komeleyê dixebitin.

h. Biryardana li ser kiriyarên komeleyê, endambûn an jî jêderketinên digel komele û sazgehên yê navneteweyî û navxweyî.

i. Weqf avakirina komeleyê,

j. Fesih kirina komeleyê,

k. Pejirîna plana stratejîkî,

l. Dan û standin û plan kirina li ser aboriya komeleyê ya ji bo sala paştir,

m. Dîyar kirina delegeyên ko dê biçin Civînen Konseya Rêxistina Lêbuhurînê ya Navneteweyî,

n. Biryardana li serrewşa wan kesên ji komeleyê hatine avêtin an jî endambûna wan nehatine pejirandin.

o. Ji bo mijarên pêwîst destûrê dana Encumena birêvebir,

p. Kirina wan karên li mevzûata Encumena giştî hatine dîyar kirin.

Encumena Giştî kontrola wan parçeyên di yê komeleyê dike û her dem ew dikare bi hêcetên biheq wan ji karî biavêje.

Avakirina Encumena Giştî ya Komeleyê, demê civînê

Xala 11ê- Encumena giştî, ji endamên komeleyê pêk tê û ew parçeya herî desthilat a komeleyê ye.

Encumena Giştî;

1- Komele di wextê ko li destûrnameyê hatiye eşkere kirin de dikare wek her demî kom bibe,

2- Li rewşên Encumena birêvebir pêwîst bibîne an jî yek ji endaman bi nivîskî wê daxwazê bike, ew di 30 rojan de kom dibe.

Encumena Birêvebir edetî li 2 salan carekê li cih, der û demê bê dîyar kirin kom dibe. Encumena Birêvebir ji bo civînê banî

Encumena Giştî dike. Encumena Giştî edetî li Adarê kom dibe.

Heger ko Encumena Birêvebir van erkên xwe pêk neîne, mafên endaman yê bi qanûnan hatine dîyarkirin hene.

Awayê Banî kirina civînan

Xala 12ê- Encumena Birêvebir li gor destûrnameya komeleyê, lîsteya ew kesên tev li Encumena Giştî bibin çêdike. Ew endamên ko dikarin tev li Encumena Giştî bibin ji beriya pazdeh rojan siet, roj û cihê civînê tê eşkerekirin û bi vî awayî li

bangên rojnemeyan an jî bi e-posteyê ji bo civînan têne banî kirin. Tê dîyar kirin gelo heger piraniya endamên vê civînê kom nebin civîna didoyê dê kengê bibe. Demê di nêvbera civîna yekê û ya didoyê ye nikare ji 7 rojan kêmtir be an jî ji 60 rojan zêdetir be.

Heger ko civîn ji bilî binasê kêmkombûna civînê bê bi paş de dan, dîsa li gor awayê agahî danê endam têne agahdar kirin. Piştî bi paş de dana civîna didoyê, di 6 mehan de ji nû ve civîn bi mecbûrî ye. Endam ji bo civîna didoyê wek li benda didoyê hatiye eşkere kirin, têne banî kirin.

Civîna Encumena Giştî nikare ji carekê zêde bê bi paş de dan.

Xala 13ê- civîn, bi kar anîna dangan(rayan), awa û rêyên biryar danê û biryarên bêcivîn û bêbanîkirin têne dayin.

A) Rêbaza Civîn Çêkirinê

Encumena Giştî bi kombûna piraniya endaman dicive lê heger ji bo fesih kirina(faşil kirin) komeleyê civînê bê çêkirinê divê ji sêyê didoyê endamên Encumena Giştî hazir bin ko civînê bê kirin; heger ji ber nehatinpiraniya endamên Encumena Giştî civînê bê bi paş de dan ji bo civîna didoyê kombûna piraniya endamên Encumena Giştî ne hewce ye. Lê belê hejmara wan endamên ko ji bo vê civînê civiyane çênabe ko ji du qetên hejmara endamên Encumena Birêvebir û Encumena Kontrolker kêmtir be.

Lîsteya wan kesên ko dikarin bikevin Encumena Giştî, divê li civînê hazir be. Ew kesên ko Encumena Birêvebir wezîfedar kirine, agahiyên ji nasnameya wan kesên bikevin civînê kontrol dikin. Endam, piştî îmzekirina li rex navê xwe yê li lîsteyê dikare bikeve civînê.

Heger hejmara pêwîst ya endamanê tamam be ev rewş tê belge kirin, an serokê/a Encumena Birêvebir an jî kesekê/a ko Serokê/a Encumena Birêvebir wezîfedar kiriye civînê dide dest pê kirin. Heger ko hejmara endamanê têra civînê çêkirinê nehebin ev yek bi destên Encumena Birêvebir tê belgekirin.

Piştî dest pê kirina civînê, ji bo bi rê ve birina civînê serokê/a civînê, têra civînê cihgirê serokî/ê û nivîsevanê civînê têne hilbijartin û bi vî awayî Encumena dîwanê tê eşkere kirin.

Di deng danê ji bo hilbijartinê parçeyên komeleyê de, ew kesên ko dengên xwe bidin divê nasnameya xwe bidin Encumena dîwanê û li lîsteya navan, li rex navê xwe îmze bike.

Barê birêve birina civînê û ewlehîya wê li ser milên serokê/a civînê ye.

Li Encumena giştî bi tenê li ser mijarên li rojevê gengeşî têne kirin. Lê belê heger bi awayekê nivîskî ji dehê yekê wan kesên li civînê hazir daxwaza mijareka gengeşî li ser kirinê bê kirin, mijara daxwazkirî bi mecbûrî dikeve rojva civînê.

Li Encumena Giştî her endamê maf heye ko yek darê dengê xwe bi kar bîne û divê ew bi şexsê xwe bi kar bîne. Serokên Rûmetê dikarin bikevin Encumena Giştî lê belê ew nikarin dengên xwe bi kar bînin.

Mijarên ko li civînê li ser gengeşî hatine kirin, têne belgekirin û nivîsevan û serokê/a dîwanê wê îmze dike. Piştî civînê belge teslîmî serokê dîwanê tê kirin. Barê parastina belgeyan û teslîmkirina Encumena Rêvebir a nû ya di heft rojan de li ser milên serokê/a Encumena Birêvebir e.

B) Rê û rêbazên dengdan û biryardana Encumena Giştî

Li Encumena Giştî hilbijartinê parçeyên komeleyê bi dengdana veşartî tê kirin, heger ko biryara hilbijartina veşartî nehatibe dayin hilbijartinê dî bi bi eşkeryî têne kirin. Dengên veşartî, piştî serokê/a dîwanê kaxeza dengdanê mohr kir, bi kar hênerên wan dangan, dengê xwe li ser nîşanê dikin diavêjin di sindoqeqa vala de û paşê bi rijandina li nêv-dîwanê têne dîyar kirin. Serokê/a dîwanê da ko dengdana veşartî li gor rêbazên dengdana veşartî bêne kirin, şertên fizîkî yê dengdanê çêdike.

Ji bo dengdanê eşkeryî, bi rêbazeka serokê/a dîwanê eşkere bike hilbijartinê tê kirin.

Biryarên Encumena Giştî bi dengdana piraniya endamanê têne dayin. Lê belê ji bo faşil kirina komeleyê divê ji sêyê didoyê hejmara endamanê hazir bin.

Ji bo guhertina destûrnameyê hilbijartina eşkeryî tê kirin.

C) Biryardanên bêcivînê çêkirinê û bê bang danê têne dayin

Ew biryarên ko hemî endamê bîyî ko tiştên li destûrnameyê hatî nivîsîn kom bibin û bidin, lê ne.

Ew biryarên ko bi vî rengî bêne dayin naçe li şûna civînên edetî.
Çêkirina Encumena Birêvebir, destûr û erkên wan

Xala 14ê-

A) Çêkirina Encumena Birêvebir

Encumena Giştî, Encumena Birêvebir wek heft endamên eslî û heft endamên cihgir dibijêre.

Endamên Encumena Birêvebir herî zêde du caran dikarin li ser hev bêne bijartin.

Xebatkarên komeleyê; piştî ko ji komeleyê derketin, dikarin piştî du salan bibin berendamên parçeyên komeleyê.

Encumena Birêvebir di civîna pêşiyê ya li piştî hilbijartinê serok, cihgirê serokî/ê, sekreter û hejmardarî/ê dîyar dike. Serok bi dengdana veşartî tê dîyar kirin.

Encumena Birêvebiriyê bi şertê ko hemî endaman jê agahdar bike dikare her dem civînan bike. Lê her meh ya kêr divê carekê civînekê bike û biryaran li ser karan bide û birêvebiriyê bike. Encumen bi hatina ji nîvî zêdetirê endaman kom dibe. Biryarên ko tên dayin heger ne rêbazeka dî neyê eşkrekirin li gor rê û rêbazên li destûrnameyê hatin dîyar kirin tên dayin ko li gor wê biryar bi hejmara endamên ji nîvî zêdetir tê dayin. Encumena Birêvebiriyê bi banî kirina ya kêr sê endaman ji derveyê adetî kom dibe.

Ji Encumena Birêvebiriyê heger kesek dest ji karê xwe berde an jî bi binasekê dî cihek vala bibe, Encumena Birêvebiriyê mecbûr e ko ji Encumena Giştî ew kesê/a herî zêde deng standî yê/a cihgir bîne cihek vala.

Ew kesên ko li ser hev bêyî hêcet du caran neyên civîna Encumena Birêvebiriyê ji Encumenê tên avêtin û di du rojan de cihgirên wan yên li Encumena Giştî biryarê dide ko di sê rojan de li gor yên gelek deng standî bi rêzê ve tên banî kirin.

Biryardana Encumena Birêvebiriyê bi dengdana piraniya endamên wê pêk tê. Ji bo wê yekê divê dema Encumena birêvebiriyê kom dibe ya kêr nîvê endaman lê hazir be û biryar bi dengê piraniya endaman bê dayin.

Endamên parçeyên komeleyê yên ne li Encumena Birêvebiriyê ne: piştî endambûna wan divê du sal biborin û paşê dikarin daxwaza lê xebitîna profesyonel bike.

B) Erk û destûrên Encumena Birêvebiriyê:

Encumena Birêvebiriyê van karên li jêr pêk tîne:

a. Qeydçêkirina komeleyê ya li gor rê û rêbazên wê

b. Temsîlkirina komeleyê an jî wezîfedarkirina endamînan ya ji bo vî karî

c. Hesabên kirina mesref û pereyên bê standin yên komeleyê,

d. Li ser rêbazên xebitîna komeleyê amadekirina pêşniyarnamê û dayîna Encumena Giştî,

e. Bi destûra Encumena Giştî kirîna mal û milkên mayinde, firotina tiştên komeleyê yên mayinde û yên dem-demî, pêk anîna çêkirina îpotek û rehîndandinên bi leyhê komeleyê

f. Pêk anîna biryarên li Encumena Giştî hatine dayin,

g. Piştî her karî, amadekirina; encamnameyê, tabloya birêvebirînameyê, tabloya pereyên hatî standin û yên hatin mesref kirin û dayîna Encumena Giştî.

h. Li ser wê yekê bisekine ko pereyên heyî di rêya xwe de bêne serf kirin

i. Biryardayîna li ser standin û jê derêxiztina endaman,

j. Girtina xebatkarên pereyî, sekinandina karên wan û kontrol kirina wan,

k. Ji bo endaman kom kirina zanîn û belgeyan,

l. Wergerandina belgeyên bi zimanên bîyanî,

m. Karkirina li gor mebest û rêyên kar kirinê yên li destûrnameyê hatî nivîsîn,

n. Koordînekirina hemî karên komeleyê

o. Bername çêkirina ji bo dewra bê,

p. Ji bo gihandina armancên komeleyê, kirina hemî karan û pêk anîna wan,

q. Banî kirina Encumena Giştî ya ji bo civînê

r. Eşkere kirina wan kesên, komeleyê temsîl bikin yên li navxweya neteweyê û navneteweyî

s. Biryar danên ko bi mewzûatê destûr heye û çêdibe ko bêyî Encumena giştî bistîne,

t. Têkilîdanîna di navbera Rêxistina Lêbuhurîna ya Tirkîyeyê û Sekreteriyaya Navneteweyî,

u. Ji bo wan mijarên ko hewce tê dîtin çêkirina Encumeneke lê şewirîne.

v. Ji bo ko armancên komeleyê pêk bên, biryardana li ser heger hewce bê dîtin, çêkirina nivîsîngeheka projeyan li derveyê Stenbolê.

Çêkirina Encumena Kontrol Kirinê:

Xala 15ê-

A) Çêkirina wê

Encumena giştî sê endamên eslî û sê yên cihgir dibijêre.

Heke, kesek dest ji Encumena Kontrol Kirinê berde an jî bi binasekê dî biçe, Encumen mecbûr e ko kesekê/î ji Encumena Giştî li gor dengstandina herî zêde bistîne.

B) Erk û destûrên wê

Encumena Kontrol Kirinê: lê dinêre ka komele li gor mebestên wê yên li destûrnameyê hatin nivîsîn bi rê ve diçe an no, ka defter, hesab û qeydên wê li gor mewzûata wan têne nivîsîn an no û raporan dinivîse û wan raporan li gor rê û rêbazên ko li destûrnameya komeleyê de hatiye nivîsîn, bêyî ko bihêle bi ser re şeş meh biborin teslîmî Encumena birêvebirîyê dike û di civînan de dide Encumena Giştî.

Encumena Kontrol Kirinê heger ko pêwîst bibîne Encumena Giştî dicivîne.

Kontrola Navxweyî ya Komeleyê û Zelalîya Wê

Xala 16ê-Komele ji bilî ko dikare kontrola navxweyî li ser Encumena Giştî, Encumena Birêvebirîyê û Encumena Kontrol Kirinê bike, ew dikare kontrolê bi rêya sazgeheka bêalî jî bide kirin. Heger ko bi rêya sazgehyên bêalî kontrol li ser Encumena Giştî û Encumena Birêvebirîyê nehatibe kirin jî erka Encumena Kontrol Kirinê xelas nake.

Encumena Giştî ya kêm di 6 mehan de carekê kontrola komeleyê dike. Encumena Giştî an jî Encumena Birêvebirîyê li ser mijarên ew pêwîst bibînin dikarin kontrolan bikin an jî li sazgeheka bêalî kontrolan bidin kirin.

Ew hewl dide, rewşa xwe ya aborîyê bi awayê herî zelal ji civatê û endamên xwe re dîyar bike. Encumena Birêvebirîyê mecbûr e ko rêyên zelal kirinê ji Encumena Giştî re dîyar bike.

Çêkirina Encumena Disîplînê, erk û destûrên wê

Xala 17ê-

A) Çêkirina wê

Encumena Giştî ji bo Encumena Disîplînê sê endamên eslî û sê endamên cihgir dihilbijêre.

B) Erk û Destûrên wê

Bi daxwaze Encumena Birêvebirîyê an jî bi biryara Encumena Birêvebirîyê ya li ser daxwaza xebatkarên/ekê/ekî Encumena Disîplînê, piştî ko xweparastina endaman/andamekî/andamekê stand, ji bo wî/wê/wan hişyar bike, şermezar bike, ji karên komeleyê ji bo demekê bi dûr biêxe an jî ji karî biavêje, dikare pêşniyarnamêyê ji bo Encumena Birêvebirîyê binivîse.

Encumena Giştî rapora Encumena Disîplînê li ber çavên xwe tîne û biryara xwe dide.

Li dijî vê biryarê mafê kesên heye ko nerazîbêna xwe di demê xwe de bide Encumena Giştî û bi rêyên hiqûqî mafên xwe bixwaze.

Encumena Disîplînê piştî ko dosyayek giha destên wê, ya herî dereng di mehekê de dicive û di demê herî zû de biryarekê li ser dosyeyê dide.

Bingeh û rêbazên xebitîna Encumena disîplînê bi rêbaznameyê têne eşkere kirin.

Kontrolkerê/a Civatî yê Komeleyê, hilbijartina wî/wê, erk û destûrên wî/wê

Xala 18ê-

A) Hilbijartina wî/wê

Encumena Giştî ji nêv xebatkarên xweyî tecrûbe kontrolkerê/a civatî yê/ya komeleyê dihilbijêre.

B) Erk û destûrên wî/wê

Kontrolkerê/a civatî yê/ya komeleyê, li ser gazindên endam û xebatkarên yên ji têkilîyên şexsî, parçeyên komeleyê û kiriyarên wê, disekine. Her dîsa ew dikeve di nêva wan kesên li hev bikevin. Ew di heqê gazindan de agahîyan dide Encumena

Birêvebirîyê û ji bo pêşlêgirtinan pêşniyaran dide. Kontrolkerê/a civatî yê/ya komeleyê, piştî jê agehdar kirina Encumena Birêvebirîyê dikare, ji bo pêşlêgirtina lihevketina xebatkaran bi xwe dest bi kiriyaran bike.

Piştî ko ew ji rûdanekê agehdar bû ew aliyên meseleyê bi bayê bezê agehdar dike û piştî ko guhdariya kesên berbehs bike ya herî dereng di mehekê de rapora xwe dinivîse. Di wê rewşa ko piştî lihevketinan kesin gazindê bigihîne wî/wê, ew rapora xwe hem dide kesên berbehs û hem jî dide Encumena Birêvebirîyê.

Kontrolkerê/a civatî yê/ya komeleyê, her sal raporeka giştî amade dike.

Rêbazên Deyndarbûna Komeleyê

Xala 19ê- Komele, heger ko pêwîst bibîne, ji bo ko bigihe armancên xwe û xebatên xwe bidomîne, dikare bi biryara Encumena Birêvebirîyê xwe deyndar bike. Deyndarbûn, dikare bi rêya krêdî standinê, karan li hinekan bide kirin an jî standina pereyan be. Lê belê, çênabe ko deynên ko komele nekare ji çavkanîyên pere standinê yê xwe bide bê standin ko wê biêxe di rewşeka xerab de.

Fesh Kirina Komeleyê û Rêbaza Dabeşkirina Mal û Milkên wê

Xala 20ê- Encumena Giştî, her dem dikare biryara fesh kirina komeleyê bide. Ji bo ko li Encumena Giştî dan-û-standinên di heqê fesh kirina komeleyê de bêne kirin divê ya kêm ji 3yê 2ya(2/3) hejmara endamên Encumenê hazir bin. Heger ko ji ber komnekirina pirabniya endaman civîn bê bi paş de dan, ji bo kombûna didoyê ne hewceyê hazirbûna piraniya endaman e. Lê belê hejmara wan endamên ji bo vê civînê dicivin, çênabe ko ji du qetê hejmara Encumena Birêvebirîyê û Encumena Kontrol Kirinê kêmtir be.

Biryara feshkirinê dikare bi dengdana ji 3yê 2ya(2/3) wan endamên ko bikarin dengên xwe bikar bînin, dikare bê dayin.

Dengdana fesh kirinê li Encumena Giştî bi awayî eşkereyî tê kirin.

Piştî ko biryara fesh bûnê bê dayin, bi rê existina dest guhertina mal, maf û malên komeleyê endamên Encumena Birêvebirîyê ya paşiyê dike. Ev kiriyarên he piştî biryara feshbûnê ya Encumena Giştî an jî bi xwe bi hatina halê feshbûnê dest pê dikin.

Destûra Encumena Tesfîye Kirinê heye û erka wê ye ko ji destpêkê heta paşiyê, li gor rêbaznameyê pere, mal û mafan tesfîye bike. Ev Encumen di destpêkê de li hesabên komeleyê dinêre. Li dema lê nêrinê defterên komeleyê, belgeyên xerckirinê wê, qeydên wê yê li banqe û tapogehê û belgeyên dî kom dike û wek belgenamêyekê amade dike. Li dema tesfîyekirinê, bangêk ji bo deynxwazên komeleyê tê kirin û heger hebe malên komeleyê bi pereyî tê hesibandin û ji deynxwazan re tê dayin. Heger deynê komeleyê li derinan an jî li hinan hebe tê standin. Piştî ko pereyê deynxwazan hat dayin û pereyên li derve hatin standin, mal, maf û pereyên komeleyê yê mayîn, ji bo cihê ko Encumena Giştî biryarê li ser bide tê dayin. Heger Encumena Giştî li ser derekê biryar nedabe, ji bo wê dera li bajarê komele lê ji sazgehên armancên wê herî nêzikî komeleyê ya herî zêde endamên wê heyîn tê dayin.

Hemî kirinên tesfîyekirinê li tesfîyenameyê tê nivîsin û ji tesfîyekirinê birêvebirên dewletî yê cihê komele lê tê agahdar kirin û ji bilî wextê bê dirêj kirin di sê mehan de tesfîye kirin tê tamam kirin. Piştî ko komeleyê tesfîyeya pere, mal û mafên xwe kir, Encumena Tesfîye Kirinê mecbûr e ko bi nivîskî, birêvebirên dewletî yê cihê navenda komeleyê lê tê agahdar bike û wê nivîsê li tesfîyenameyê zêde bike.

Encumena Birêvebirîyê ya paşiyê, bi wesfê xwe yê Encumena Tesfîye Kirinê, mecbûr e ko hemî defter û belgeyên komeleyê biparêze.

Ev kar dikare ji bo kesekê li Encumena Birêvebirîyê jî bê dayin. Demê parastina van defter û belgeyan 5 sal in.

Di rewşa fesh bûnê de mal û milkên komeleyê ji bo Sekreteryaya Navneteweyî (IS) ya Rêxistina Lêbuhurînê tê dayin heger ko ev yek çênebe ji bo n jî weqfeka ji bo mafên mirovan dixebite tê dayin.

Kêmaya Biryaran

Xala 21ê- Di heqê wan mijarên ko li vê destûrnameyê de nehatiye nivîsin, biryar li gor Qanûna Komeleyan, Qanûna Medenîbûnê ya Tirkan û qanûnên têkilîdar tèn dayin.

Xala nemayinde – 1

Rêbaznameya Disiplînê ya rêbaz û bingehe lê ne, ya ko li Xala 17ê ya Destûrnameyê hatiye nivîsin; Piştî Encumena Birêvebirîyê ya li 22.04.2012ê bê bijartin di 4 mehan de piştî bê weşandin tê pêk anîn.